Nûçeyên Hackney Homes
Cotmeh 2007

Bêtir tamîr ji bo nişteciîhan

Piştî şêwirdarîyên kûr û fireh bi nişteciîhan re, ku komên fokusê û lêkolîneke bi postê jî di nav de bûn, Hackney Homes xizmeta tamîran berfirehtir dike.

Berfirehkirina xizmetê di nîvê Îlonê de ji alîyê desteya rêvebir a Hackney Homes ve hat belêkirin û guhertin di 1ê Cotmehê de hatin bicîhkirin.

Anku nuha nişteciîh dikanin yelpazeyek firehtir a xizmetên pêşkêşkirî bikar bînin, ewên ku berê berpirsîya nişteciîhan bûn. Ev di nav de ne:

Li serşokê: Hackney Homes ê mûslixê dilopkirî tamîr bike û pûlan biguherîne; panelên serşokê tamîr bike û serşok û destşokên xetimî çêbike.

Li herêmên rûniştinê: Hackney Homes ê nuha derîyên hundir, kilît û destikên derî biguherîne; qulikên derî yên lênêrînê, hejmarên derîyan û destikên wan tamîr bike; cama derizî yan jî ji ber çewisandin an dizîyê şikestî biguherîne; plastera dîwarên hundir (ên ku eşkêla wan ji 150mm bêtir be) û bin sewaxê tamîr bike û nuh bike .

Ji bo garajan: Hackney Homes ê kilîtên derîyê garajê tamîr bike an biguherîne û wê serbanî û derîyan bi awayekî plankirî tamîr bike.

Li metbexê: Hackney Homes ê mûslixan çêkê; destşokên xetimî veke; derî, berkêşk (dexlik) û desgehan biguherîne û heke neyê tamîrkirin, unîtên metbexê biguherîne.

Li Tûwaletê: Hackney Homes ê cîhên xetimî veke, heke nişteciîhan bi xwe ceribandibin, lê bi ser neketibin.

Li gel berfirehkirina xizmetê, guhertinên din jî di polîtîka tamîran de hatine kirin. Pêwîstîyên nişteciîhên rewşa wan xesas tên naskirin û dê pêşanî jê re bê dayin. Nişteciîh, wek mînak, heke kal û pîr bin, zarokên wan ên pir piçûk an seqetîyên wan hebin, dikanin wek ku rewşa wan xesas e bên hesibandin. Her weha polîtîkayeke nuh a heq sitendinê jî dê hebe, ku dê bike ku nişteciîhên ku bi zaneyî zirar dane milkê xwe an jî ew îhmal kiribe, bihayê tamîrên çêkirina tiþtên zirardîtî bidin.

Pakêtên agahîyê dê bi hejmara Mijdarê ya *Nûçenameya Hackney Homes* re bên şandin.

Ji bo raporkirina tamîran an jî bêtir agahîyê, ji kerema xwe bi Navenda Têkilîyê ya Tamîran re têkilîyê çêbikin: 020 8356 3691.

KURTÎYA NÛÇEYAN

Vê mehê tev li *Pink* bibin

Li Kralîyeta Yekbûyî (KY) her sal 44.000 mirov bi kansêra pêsîran tên teşhîskirin ku 330 ji wan mêr in. Li Îngîlîstanê awayê herî belav ê kansêrê ye. Hun dikanin vê Cotmehê tev lê bibin û alîkarîya piştevanîya Haydarbûna Kansêra Pêsîran a Mehê bikin; an ku tev li *Pink* bibin û ji bo mirovên ku bandora kansêra pêsîran lê bûye peran kom bikin.

Hun dikanin ji bo komkirina peran partîyeke *In the Pink* saz bikin – hema hevalan, malbatê, hevalên kar û fêrgehê vexwînin? An jî hun dikanin hejmarek berhemên pembe (pink) bikirin; li webîsteya Lênêrîna Kansêra Pêsîran, Boots an jî ASDA peyde dibin. An heke hun hez dikin li ser înternetê peran bibexşînin, biçin bo www.breastcancercare.org.uk an jî telefon bikin: 0845 092 0817.

Pev re bimeşin ku çalak bibin

Li gavên hêsan ên awayekî jîyana bijûntir digerin? Çima tev li Meşên Bijûn li seranserî Hackney nabin?

Meş ji bo mirovên di her temenî de dibin, bi taybetî yên ku nuh dest pê dikin, heke hun xwe ne zînde his dikin, an jî ji 50 salî meztir. Meş 30–60 deqîqan dajon û ji alîye rêberekî Meşa Bijûn ve tê birêvebirin ku her weha di alîkarîya pêşî de perwerde jî bûye.

Bi hatina her kesî kêfxweş dibin! Ji bo bêtir agahîyê, ji kerema xwe têkilî çêbikin bi Surbjit Mahey re:
078 9149 8150.

Meha Dîroka Reş

Meha Dîroka Reş vê Cotmehê li Hackney tê pîrozkirin. Civînên xebatê, pêşangeh, fîlm kişandin, tîyatro û çalakîyên din di seranserî mehê de birêvebirina wan tên plankirin ku dewlemendîya tecrubeya hunermend û sazîyên herêmê bikêr bîne.

Ji bo ku mirov mîrata çandî ya cîhêreng a civakên Afrîkî û Karayîbî li Hackney bêtir nas bikin, dê gotûbêjên çandî hebin. Pirtûkxaneyên Hackney ê bi gelek bernameyên cîhêreng ên ji nivîskar û helbestvanan heta mûzîk û xwarinê, tev li pîrozbahîyan dibe.

Ji bo bêtir agahîyê biçin bo: www.hackney.gov.uk/black-history-month

Karta Nêrevanên Hackney derket

Karta Erzanîyê ya Nêrevanên Hackney nuha derketiye. Armanca kartê ew e ku desthilatî û teşwîkê bide nêrevanan, da ku xwe bidin naskirin û xwe bigihînin erzanîyên ku li bêtir ji 50 dikanên li navçeyê ji bo wan tên pêşkêşkirin.

Heke hun li Hackney nêrevanek bin, serî li kartê bixin, biçin: www.hackney.gov.uk/s-cc-carers-card an jî telefon bikin: 020 8356 5054.

Di Desteya Birêvebir a Hackney Homes de rêberîya nişteçîhan

Rupert Tysonê nişteçîhê Hackney wek Serokê Desteya Birêvebir a Hackney Homes hatiye hilbijartin û nişteçîhên din Audrey Villas û Alice Burke wek Cîgirên Serok hatine tayînkirin.

Tecrubeya her sêyan di nav tevgera kirêdaran de pev re hema hema 70 salan dike. Rupert dibêje ku ew bi heyecan dipê ku rêberîya Hackney Homes bike û çêtirkirina xizmetan ji bo nişteçîhan bidomîne.

“Ji dema ku Hackney Homes 18 meh berê dest pê kir bal li ser çêtirkirina xizmetên mişterî kom bûye. Me pêşketin pêk anîye, lê belê hîn jî gelek tiştên kirinê hene,” digot Rupert.

“Teşwîkkirina nişteçîhan ji bo tevlêbûnê û dîyarkirina nêrînên xwe yên li ser xizmetên ku distînin û ku ji bo malên xwe û hawirdora xwe çi dixwazin ew tişt in ku ez li ser pir bi hewes im û ez ê bala xwe li ser kom bikim.

“Ez hêvî dikim ku tayîna min li gel a Alice û Audrey nişteçîhên din ji bo tevlêbûnê teşwîk bike û raber bike ku ev sazî dilsoz e ji bo nişteçîhên ku xizmeta wan dike.”

Susmita Noonan, Serok Birêvebira Demî got ku tayînan bal kişand ser tevlêbûnên nişteçîhan.

Susmita wanî digot, “Rupert Serokê me yê yekemîn ê nişteçîh e û endamên mayî yên desteya birêvebir dengeke xurt daye ku ev sazî divê ji alîyê nişteçîhekî ve bê birêvebirin”.

“Rupert, Audrey û Alice bi deh salan li Hackney rûniştine. Ew dizanin ku çi dijwarî hene, ew dizanin ku meriv dikane çawa jîyana li sîteyên Hackney çêtir bike û ew alîyên erênî yên rûniştina li vê navçeya cîhêreng dizanin.”

Hem Rupert û hem jî Susmita dibêjin ku sala bê balê li ser wê yekê be ku ji Komîsyona Kontrola Hesaban du stêrk bên sitendin, da ku fona Hikûmetê ji bo serfkirina li malên Şaredarîyê bê serbestkirin.

“Ez fahm dikim ku gelek nişteçîh ji dereceya nuha ya yek-stêrk a ji Komîsyona Kontrola Hesaban hêvîşikestî bûn. Desteya Birêvebir xwe-bawer e ku Hackney Homes dikane di 2008an de bibe sazîyeke du-stêrk û em bi xurtî bala xwe li pêkanîna vê armancê kom dikin,” Rupert wanî digot.

“Ez ji hemû nişteçîhan bi israr dixwazim ku bawerîya xwe bi Desteya Birêvebir û Hackney Homes bînin ku ew ê xanîyên birêkûpêk li Hackney pêşkêş bikin. Em hemû dilsoz in ku Hackney bikin cîhekî çêtir ê jîyanê û em bi nişteçîhên seranserî navçeyê re xebatê dikin ku vê yekê pêk bînin.”

Hun dikanin agahîya li ser awayê tevlêbûnê li www.hackneyhomes.org.uk peyde bikin, an jî telefonî tîma Tevlêbûna Nişteçîh bikin: 020 8356 7845.

Masterplana Woodberry Down hat belêkirin

Masterplana Woodberry Down ku avakirina bêtir ji 4.500 malên cîhêreng ên ji bo kirê di nav de ye, meha çûyî ji alîyê Komîteya Jêrîn a Plansazîya Hackney ve hat belêkirin.

Masterplan ji alîyê Hackney Homes ve bi nişteçîhên herêmê re hat amadekirin û projeya giştî ya 20 salan a regenerasyona 1 milyar pound pêşkêş dike; plansazîyên bi kitkit ên ji bo herêmên taybetî dê piştî wê pêk werin.

Li gel zêdebûna hejmara xanîyên li gora budçê, bi awayên jêrîn jî bi kêrî herêmê tê:

- muayenexaneya GP (doktorê taxê) ya nuh û firehkirî
- navendeke zarokan
- yelpazeyek cîhên vekirî yên çêtirkirî ku bi ser rezervûaran ve ne
- xwendegeheke destpêkê ya firehkirî
- Xwendegeheke navîn a nuh a City Academy
- Cîhekî perwerda kar ê nuh ku mirovên herêmê bikanibin karên li herêmê bikin
- klubeke ciwanan
- navendeke civakê

Projeya Woodberry Down dê tedbîrên ji bo hawirdorê dostane, yên wek sîstema birêvebirina ava ji bahozê mayî û ji alîyê çavkanîyên nûjenbar ve derfeta unîtên germ û enerjîya pev re, pêşde bixe.

Endamê Encumanê Jamie Carswellê Cîhgirê Şaredarê Hackney wisa digot: "Ev nûçe ji bo yek ji projeyên regeneresyonê yên herî mezin ên Londonê baş e û nîşaneke din a erênî ye ji bo nişteçîhan ku her tişt teşeyê xwe distîne.

"Woodberry Down ne tenê kerpîç û xerc e, ew bêtir ji bo wan civakan e ku li wir dijîn û ji bo bicîhkirina kêrhatîyên vê transformasyonê ji bo her kesî ye."

TEV LÊ BIBE

Piştevanîya Civakê li Stoke Newington

Offîsa Taxa Bakurê Rojava vî çendî bi weqfa regenerasyona civakê ‘Genesis Community’ re hevkarîyê dike û ji bo nişteçîhên sîteyên Rhodes, Somerford û Shacklewell gereke bo Southend saz kiriye.

Bêtir ji 100 nişstecîhan tev li wê rojê bûn ku tevlêbûna înîsîyatîvên ciwanan û Komelên Kirêdar û Nişstecîhan pêşde bixe.

‘Projeyên taybetî nişstecîhan digihîne hev

Ji dema ku fona Projeyên Taybetî di Sibatê de hat serbestkirin, bêtirî 25 Komelên Kirêdar û Nişstecîhên li Hackney ji bo fonê serîlêdanên serketî kirine, ku ji Baca Kirêdaran peyde dibû.

Fon wek encameke astên çêtirkirî yên komkirina kirê pêk hat û ji bo hemû Komelên Kirêdar û Nişstecîhên Şaredarîya Hackney ên qeydkirî peyde dibe.

Di nav serîlêdanên vê dawîyê de ev hebûn:

- Ji bo ciwanên Regents Estate rojeke gerê;
- partîyeke destpêkirinê û BBQ (manqil) ji bo bexçeyekî civakê yê nuh sazkirî li Acton Estate;
- rojeke kêfê li Harman Estate ku cîherengîya dewlemend a herêmê pîroz bike;
- civîneke xebatê ya huner û mîmarîyê bi navê ‘Wêneyê Bajêr’ li Shrubland Estate. Vê projeyê vedîtina girêdanên di navbera mîmarî û civakî de pêk anî, bir rêya naskirina avahî/cîhên gelêrî yên taybetî û xêzandina wan li ser panelên dar û rûyên din.

Hîn jî ji bo serîlêdanê dem heye …
Komelên Kirêdaran an Kirêdar û Nişstecîhan dikanin ji bo fona Projeyên Taybetî serîlêdanê bikin – nûner tên vexwendin ku pêşniyara projeyeke ku bikanibe mirovan bigihîne hev û bi kêrî civakê were, pêşkêş bikin.

Divê nişstecîh bi Komelên Kirêdaran an Kirêdar û Nişstecîhan re xebatê bikin û projeyên wan bikin rasteqînî!

Ji bo formên serîlêdanê an jî bêtir agahîyê, ji kerema xwe bi Komela xwe ya Kirêdar û Nişstecîhan re têkilî çêbikin, an jî telefonî Faisal Pirbhai bikin: 020 8356 2126.

Komên Fokusê yên Xwedî-Lease’an

Encamên Lêkolîna Xwedî-Lease’an ku îsal hatiye pêkanîn derketine û Xwedî-Lease’an hinek qadên xizmeta Hackney Homes tespît kirine ku li gora wan jê re çêtirkirin pêwîst e. Qadên wek nirxa pere û şêwirdarîyê wek ku çêtirkirina wan pêwîst e tên dîtin.

Wek bersîva vê şûnve agahîdayinê, tîma Xwedî-Lease’an û Mafê Kirînê ji bo nişstecîhan komên fokusê saz dike ku li ser qadên taybetî yên xizmetê û ku bi dîtina wan divê çawa bên çêtirkirin, nêrînên xwe dîyar bikin.

Em li dilxwazan digerin ku ji bo gotûbêjkirina van mijaran tev li komên fokusê bibin.

Kesekî serbixwe yê komên fokusê birêve bibe, da ku karên wan hêsan bike û nehênîbûnê biparêze; ev ê ji nîvê Mijdarê heta nîvê Çileyê Pêşîn bidome. Du komên fokusê dê li Christopher Addison House'a li Wilton Way (li paş Hackney Town Hall) bên lidarxistin.

Em ê her weha bi £20an fîşên kirînê yên Marks and Spencer bidin kesên ku tev lê dibin.

Heke hun dixwazin ku tev lê bibin, ji kerema xwe telefonî tîma Xwedî-Leasae'an li 020 8356 2288 bikin, email bişînin bo LHFHnews@hackneyhomes.org.uk an jî bi postê bo Pat Ronayne li Leasehold & Right to Buy Services, 298 Mare Street, London E8 1HE.

Ceribandina vezîvirandina (recycling) xwarinên avêtî dest pê dike

Vezîvirandina xwarinên avêtî li 5000 malên li sîteyên hilbijartî û milkên bilind ên Hackney pêk tê. Ev parçeyekî karê domdar ê tîma vezîvirandinê ya Şaredarîya Hackney e ku awayê herî baş ê komkirina vezîvirandîyên van milkan tespît bike.

Proje derfetê dide nişstecîhan ku avêtîyên xwarina xwe vezîvirînin, ew dibin kompost û li bexçan û cîhên hêşîn ên sîteyên wan tên bikaranîn.

Qutîkeke piçûk a şîn û gilokek kîsên ku tên kompostkitin ji nişstecîhan re tên dayin. Qutîk li metbexê tê danîn û kîsikekî kompostbar tê de tê bicîhkirin ku ji bo komkirina avêtîyên xwarinê amade be. Dema ku kîsik tije dibe, devê wê tê girêdan û tê xistin bo cîhê xwarina avêtî yê li kêleka tesîsên nuha yên vezîvirandinê.

Nişstecîhên ku tev li vê ceribandinê dibin nahêlin ku avêtî di çût û bermîlên avêtîyan de birizin û îhtîmala xeşeretên wek mişk û rêvîyan li herêmê kêm dikin. Kêrhatineke din jî ew e ku kompost wisa tê bikaranîn ku Hackney bibe navçeyeke paqijtir û hêşîntir.

Ji bo bêtir agahîyê, telefonî xeta sor a vezîvirandinê bikin: 020 8356 6688 an jî biçin www.hackney.gov.uk/recycling

Perwerde ji bo Nêrevanan

Hun li kesekî dinêrin? Hun bê mûçe dixebitin? Kesê ku hun lê dinêrin li Hackney rûdine?

Xizmetên Civakê yên Hackney ji bo Nêrevanan kursên bêpere birêve dibe. Kursên ku ji alîyê perwerdekarên bi tecrube tên birêvebirin, şêwirdarîya kêrhatî pêşkêş dike û wê bawerîyê dide we ku hun wek Nêrevanekî karê herî mimkun bikin.

Ji bo perwerda BÊPERE a van mijaran nuha serî lê bidin:

- Lênêrîna we

- Tendurustî û xweşhalîya we
- Pereyê we
- Kar dîtin

Divê ez bi kê re têkilî çêbikim?
Bi 020 8356 3732 têkilî çêbikin bi Xizmetên Perwerdeya Nêrevanan ên Hackney re têkilî çêbikin an jî biçin: www.hackney.gov.uk. Ji bo daxwaza alîkarîya lênêrîna kesekî telefon bikin bo Nirxandina Nêrevanan: 020 8356 6262.

Hînbûn û pere qezenckirin – şagirtên Hackney Homes bibînin

Rûyên nuh û tije hewes, Hackney Homes vê mehê xêrhatin da sêzdeh şagirtên ciwan.

Serîlêdêrên serketî yên di navbera 16 û 19 salî de ku ji sedan mane pêvajoyeke serîlêdanê derbas kirin ku ji hevpeyvînekê û testeke nivîskî pêk dihat.

Şagirtên ku di yelpazeyek qadên cîhê yên wek borî, elektrîk, xeratî, boyax û dekorasyonê de huner pêşde dixin, dê heftê çar rojan li gel birêvebirekî kûalîfîye bixebitin û heftê rojekê jî biçin kolejê.

Ew ê jîrektîyên nuh hîn bibin, mûçe (meaş) bisitînin û zanîna jîyanî bidest bixin ku wan ji bo rêya pêşedema pîşeyê xwe bikin pêlik. Zach, şagirtekî karên elektrîkê yê 16 salî wanî digot, “Min agahîya li ser projeyê ji şêwirdarê xwe yê pîşeyî sitend û biryar da ku serî lê bidim. Çav li rê me ku kûalîfîkasyonên xwe bisitînim û tecrubeya xwe pêşde dixim”.

Xelat sitendin

Du şagirtên Hackney Homes ku vê nêzîkê perwerdeya xwe ya şagirtîyê qedandin ji ber serketinên xwe yên berbiçav xelatên Jack Petchey sitendin.

Callie Duncan û Sadiqur Rahman ku her du jî perwerda xeratîyê (necarî) dibin, ji bo karên xwe yên baş, dilsozî û kalîteya bilind a karê xwe ji alîyê hevalên kar û birêvebiran ve hatin pesindayin.

Her duyan jî îsal Koleja Civakî ya Hackney qedandine û nuha ji bo Hackney Homes gişt-dem kar dikin.

Serîlêdanên ji bo şagirtên nuh ê di nîvê 2008an de dest pê bikin. Agahîya li ser vê dê li websîteya me peyde bibe: www.hackneyhomes.org.uk

Li malê enerjîyê teserûf bikin û ji alîyê xwe ve hawirdorê biparêzin

22–28 Cotmeh Hefteya Teserûfa Enerjîyê ye ku bale dikişîne ser tiştên herî hêsan ên ku hun dikanin ji bo kêmkirina bandora me ya li hawirdorê bikin.

Hackney Homes li gel Trosta Teserûfa Enerjîyê xebata tîmî dike ku ji hemû nişteçîhan bixwaze ku vê mehê ji bo pêkanîna hinek guhertinên piçûk û teserûfa enerjîya li mala xwe çend deqîqan veqetîne.

Ez dikanim çi bikim?

Ji bo ku hun hema nuha enerjîyê teserûf bikin, hun dikanin gelek tiştên hêsan bikin. Ne tenê hun ê tev li parastina hawirdorê bibin, hun ê her weha bi rêya enerjîya bi bandor, bikanibin her sal heta £250an ji fatorên xwe yên enerjîyê teserûf bikin.

Ji bo destpêkê hun dikanin li van ramanan binêrin:

- Dereca termostata xwe daxin. 1℃ kêmkirina germîya odeya we dikane fatorên we yên germkirinê heta %10an kêm bike. Hun her weha dikanin her sal heta £40an teserûf bikin.
- Serê êvarê perdên xwe bigirin ku germahî di pacan re neçe.
- Her dema ku hun ji odeyekê derdikevin, lampên wê vemirînin.
- Pêwengên elektrîkî li standby (girtî lê ne vemirandî) nehêlin û ku pêwîstî tunebe pêwengan çarj nekin.
- Heke hun cilşoyê, zuhadêra kincan an firaxşoyê tije nakin, programa nîv-tije an ekonomî bikar bînin.
- Tenê bi qasî ku ji we re pêwîst e avê bikelînin.
- Mûslixeke ava germ ku dilopan bike, enerjîyê serf dike û di hefteyekê de bi qasî ku meriv kuvetekê nêvî bike ava germ serf dike; lewra mûslixên ku av tê re diçin tamîr bikin û bila bi giştî girtî bin!
- Ampûlên ronahîyê yên teserûfa enerjîyê bikar bînin. Tenê yek ji wan di hemû jîyana ampûlê de dikane ji we re £60an teserûf bike – û ji ampûlên elektrîkê yên adetî 10 qatan dirêjtir dixebitin.

Ji bo bêtir agahîya li ser teserûfa enerjîya li malê, biçin: www.hackneyhomes.org.uk

QEZENC BIKIN
‘Standby buster’ek dike ku hun hemû pêwengên elektrîkî yên li mala xwe bi dûr-kontrolê vemirînin (ji dewsa ku wan yek bi yek vemirînin). Em ji van pêncan didin.

Ji bo qezenckirinê hema emailekê bişînin bo housingeditor@hackneyhomes.org.uk
û awayekî ku hun li malê enerjîyê teserûf dikin, ji me re bibêjin.

GUHERÎNA TARÎXÊ

Ji ber rewşên ku em nikanin kontrol bikin, em mecbûr man ku Konferansa Xwedî-Lease û Xwedî-Milkan taloq bikin bo mehên pêşî yên sala bê.

Me ji bo Konferansê bersîveke pir baş sitend û bêtirî 250 Xwedî-Lease û Xwedî-Milk dîyar dikin ku dixwazin werinê, ji lew re em ê dûre her kesî agahdar bikin ku Konferansê kengî bê li dar xistin.

Nûçeyên Xwedî-Lease û Xwedî-Milkan

Fatoreyên **Mesrefê Xizmetê yê Rastî** ji bo sala fînansê ya 2006/07an nuha li gel broşureke Pirsên Pircar ku biha û xizmetên ku ji sîte an bloka we re tên pêşkêşkirin îzeh dikin, ji bo Xwedî-Lease û Xwedî-Milkan hatine weşandin. Ji kerema xwe demê veqetînin û vê agahîyê bixwînin.

Heke li ser fatora we pirsek we hebe, hun dikanin li gel Tîma Hesabên Bihayê Xizmetê li 020 8356 2099 têkilî çêbikin, an jî email bişînin bo service.charges@hackneyhomes.org.uk.
Heke hun dixwazin karmendekî bibînin ku fatora xwe gotûbêj bikin, em bi xurtî temî li we dikin ku hun randevûyekê saz bikin, ji ber ku heke hun randevû saz nekin, dibe ku hun demên dirêj bipên. Em ê her wisa di her du hefteyên pêşî yên piştî weşandina fatora we de xizmeta telefonê ya berfirehkirî jî ji 9.00an heta 21.00an pêşkêş bikin.

Ji bo kesên ku di dayina bihayên xizmetê de dijwarîyan dibînin, ji kerema xwe bi Tîma Karûbarên Hatinî re li 020 8356 2299 têkilî çêbikin, ew ê bikanibin li ser pişteyanîya ku peyde dibe şêwirdarîya we bikin.

Raporên hesabên bihayê xizmetê dê di dawîya Cotmehê de ji bo we bên weşandin. Muamelên di navbera Nîsan 2006 û Cotmeh 2006an de kirî jî dê di nav de bin.

Hackney Homes ji bo hemû xwedî-lease û xwedî-milkan pirsnameyên li ser Xwe Gîhandina Xizmetan diweşîne ku mişterîyên me bêtir nas bike. Kopîyeke pirsnameyê dê bi fatoreyên we yên bihayê xizmetê ve be. Ji kerema xwe formê tije bikin û ji me re bişînin, da ku em bikanibin xizmetên xwe weha biguherînin û çêtir bikin ku li gora pêwîstîyên we bin. Wek mînak, heke em zanibin ku hun kêm dibînin, em dikanin nivîsên bi tîpên gir çap bikin.

We dizanî?

Gelek mirovên navdar li Hackney jîyane an jî perwerde bûne. Marc Bolan, sitranbêjê sereke yê 70an ê ‘Glam Rock’ band T. Rex, li Stoke Newington mezin bû. Daniel Defoe, nivîskarê Robinson Crusoe jî li Stoke Newington rûniştiye. Nivîskar Edgar Allan Poe ku di nav berhemên wî de The Pit and the Pendulum û The Raven hene, çûye Xwendegeha Manor House ku berê li Stoke Newington Church Street bû.